

Rêziknameya Parastina Ji Koronayê ya Ren Westfalyaya Bakur

Rêziknameya Parastina Ji Koronayê heta kengê derbasdar e?

Rêziknameya Parastina Ji Koronayê ya Ren Westfalyaya Bakur ji 21ê Tebaxa 2021an heta 17ê Îlona 2021an li dar e.

Gelo dereceyên cihê yên zêdebûna wê dîsa derbasdar bin?

Na. Li gor biryara hevpar a koneyên eyaletên federal a di 10ê Tebaxa 2021an de, di Rêziknameya Parastina Ji Koronayê de ku di Ren Westfalyaya Bakur de ji 20ê Tebaxa 2021an vir ve derbasdar be dereceyên zêdebûnê tune ye, li dewsa vê nîrxên zêdebûnê hatine destnîşankirin: 35.

Eger 7 roj nîrxê zêdebûnê derkeve ser 35an, dê bi pêkanîna rêzikên 3G tedbîrên girantir li dar bin. Nîrxê zêdebûnê di asta eyaletê de ji ber ku di ser 35an e li eyaletê bi giştî, ango li navçe û cihên din ên ku nîrxê zêdebûnê ji 35an kêmtir e jî rêzikname ketiye merîyetê.

Rêbazên Rêziknameya Parastina Ji Koronayê ku dê piştî 20ê Tebaxa 2021an li dar be çi ne?

Rêzika giştî ya Rêziknameya Parastina Ji Koronayê ew e ku mirovên ku hatine vaksînkirin an jî nexweşî derbas kirine dikarin herin hemû cihan û sûd ji hemû derfetan bistînin. Ji tedbîrên ku heta niha derbasdar bûn tedbîra bikaranîna maskan li cihên girtî û li cihên din ên ku metirsîya enfeksiyona bilind in û eger nîrxê zêdebûnê di ser 35an be ji bo mirovên ku nehatine vaksînkirin an jî nexweşî derbas nekirine hin kar tên kirin û mecbûrîyeta testa vîrûsê ji bo tevlêbûna organîzasyonan didome.

Di mijara hevdîtina bi kesên din re de tu sînordarîyek êdî tune ye, her wisa daneyên li ser şopandinê êdî nayên berhevkin.

Rêzikên ceribandî û testkirî yên rabûn û rûniştinan (AHA) hîn jî ji bo kesên rasteqîn tên pêşniyarkirin. Hin rêzikên hewadarkirin û paqijîyê [di pêvekeke kurt de](#) bi kurtî hatiye nîşandan û tedbîrên parastinê yên karsaz divê di cihê karên xwe de pêk bînin, tedbîrên parastina ji enfeksiyonê temam dikin.

Ma mecbûrîyeta bikaranîna maskan didome?

Belê. Li derveyî nîrxê zêdebûnê, li cihên ku li xwarê hatine dîyarkirin mecbûrîyeta bikaranîna maskan didome:

- Di veguhastina giştî de
- di cihên girtî yên qelebalix de, wek mîna di cihên danûstandinê de,
- Di nav qelebalixa mirovan de û di standên danûstandinê de
- Di organîzasyonên ku zêdetir ji 2500 kesan li cihên vekirî kom dibin de.

Di mecbûrîyeta bikaranîna maskan de çi îstisna hene?

Li gor rêzîknameyê di mecbûrîyeta bikaranîna maskan de hin îstisna hene. Li gor vê di hin rewşên îstisna de mecbûrîyeta bikaranîna maskan tune ye.

- Di cihên girtî yên mirovên dîyar de,
- Di cihên girtî yên kar te ku mesafeya civakî tê de dikare were parastin,
- Di dema mudaxeleya hêzên asayîş û vemirandina agir hwd. De
- Dema têkilîdanîna bi wan mirovan re ku ji hêla bihîstinê ve astengdar in an jî kêr dibihîsin,
- Mirovên ku ji ber seredemê pizîşkî nikarin maskan bi kar bînin (raporta pizîşkan mecbûr e).

Di rêzîknameyê de ji bilî van jî lîsteya gelek rewşên îstisna hatine destnîyankirin. Ji bo zarokên pêş dibistanê jî mecbûrîya bikaranîna maskan tune ye. Zarokên ku temenê wan di navbera temenê pêşdibistanê û heta 13 salî ne eger ji ber mezinbûna masken nikaribin maskên pizîşkî bi kar bînin, li dewsa wê dikarin maskên rojane bi kar bînin.

Eger nîrxê zêdebûnê di ser 35an re be rêzîkên derbasdar ên 3G çi ne?

Mirovên ku bi temamî hatine vaksînkirin an jî nexweşî derbas kirine dikarin sûd ji hemû cihên girtî û derfetan bigirin. Ji ber zêdebûna hejmara enfeksiyonan her kesê ku bi temamî nehatîye vaksînkirin an jî nexweşî derbas nekiriye di nîrxê 35an û asta 7 rojî de ji bo ku tev li hin organîzasyonan bibin û hin karên dîyar bikin divê testên negatîf bistînin.

Di asta zêdebûna 35an de testa negatîf koronayê ji bo çi hewce ye?

Cihên ku kesên ku bi temamî nehatine vaksînkirin an jî nexweşî derbas nekirine (herî zêde ji bo 48 saetan) bi testa negatîf a PCRYê dikarin herin:

- Organîzasyonên di cihên girtî de, bi taybetî di cihên perwerde, çand û bêhnvedanê de
- Pêşangeh û kongreyên ku di cihên girtî de tên lidarxistin
- Di avahiyên spor û tendirustî de an jî çalakîyên hevcurê di cihên girtî de
- Restorantên di cihên girtî de
- Di cihên ku xizmetên ji nêz ve tên dayîn yên wekî kuafor, xizmetên bedewî û laşî de
- Di cihên bicihbûnê de kesên ku nehatine vaksînkirin divê di dema ketinê de testên xwe nîşan bidin û piştî têketinê ji bo her 4 rojan divê test bikin
- Organîzasyonên mezin ên ku di qadên vekirî de tên kirin (zêdetir ji 2500 kesan)
- Di geştên turîstîk ên bi otobusan de, di geştên ku bi zarok, civan û malbatê re tên kirin de

Di asta zêdebûna 35 an jî bilindtir de testa negatîf a PCR ji bo çi hewce ye?

Kesên ku bi temamî nehatine vaksînkirin an jî nexweşî derbas nekirine ji bo ku tev li wan organîzasyonan bibin ku lê metirsîya pêketina bi nexweşiyê zêde ye û bikarin sûd ji xizmetan

werbigrin (herî kêr ji bo 48 saetan) divê testa negatîf a PCRê bistînin. Cihên ku ev rewş derbasdar e

- Klûb,
- Dîsko,
- Organîzasyonên dansê,
- Pîrozbahîyên taybet ên bidans
- Xizmetên seksî.

Li derveyî nirxê zêdebûnê, ji bo çî sedemên din hewcedarî bi testa koronayê heye?

Li hin cihên dîyar, kesên ku di koma metirsîya bilind de cih digirin dê werin parastin. Zîyaretvan yan bi temamî hatibin vaksînkirin, yan nexweşî derbas kiribin yan jî testên negatîf standibin.

Kesên ku bi temamî nehatine vaksînkirin an jî nexweşî derbas nekirine ji bo ku bikaribin tev li van avahîyan bibin, li derveyî asta zêdebûna 7 rojê, divê tekez testa koronayê (herî zêd 48 saetî) bikin.

- Nexweşxane,
- Cihên çavdêrîya kal û pîran,
- cihên taybet ên ku ji bo piştgirîya entegrasyonê tîk bikaranîn û cihên din ên hevcurê
- Avahîyên razanî yê alîkarîya civakî
- Cihên hêwirînê yê ku penaber bi awayekî komî lê dimînin.

Di wan organîzasyon û avahîyan de ku zîyaretvan û qelebalixî tê de hene çî rêzikên hîjyenî tîk bicihanîn?

Di derheqê Rêzîknameya Parastina ji Koronayê de [di pêveka bi navê "Hîjyen û Rêzikên Parastina ji Enfeksiyonê" de](#) di xala duduyan de lîsteya rêzikên mecbûrî yê van cihên kar ên ku ji mişterî û zîyaretvanan re vekirî ne hatîye destnîşankirin.

Di sazî an jî organîzasyonên perwerdehî û çandî de çî rêzik derbasdar in?

Di sazî an jî organîzasyonên perwerdehî û çandî de di civîn, pêşangeh û kongreyan de li wan cihên ku mirov bi awayekî sabît rûdinin an jî li ser pîyan disekin û mesafeya civakî ya 1,5 metre tê parastin an jî eger hemû beşdar bi temamî hatibin vaksînkirin an testa wan a nefatîf hebe, mecbûrîyeta bikaranîna maskan tune ye.

Li ser şopandina kesan dane nayên berhevkin.

Rêzikên derbasdar ên ji bo pîrozbahîyên taybet ên mîna dawet an jî rojbûnan çî ne?

Pîrozbahîyên taybet bêyî sînardarîyeke tîkîliyê û qeyda zanyarîya şexsî dikarin werin kirin. Baldarî: Di pîrozbahîyên bi dans de kesên ku bi temamî nehatine vaksînkirin an jî nexweşî

derbas nekirine eger testa negatîf a PCRê nîşan bidin, dikarin bêyî mask tev li pîrozbahîyê bibin. Di asta zêdebûna 35 an jî bilindtir de testa negatîf a PCRê divê were nîşandan. Îstisna: Zarokên pêş dibistanê û xwendekar bêyî ku testa PCRê nîşan bidin dikarin tev li pîrozbahîyên taybet bibin.

Ji bo prova û performansên li ser sehneyê yê komên muzîkê û koroyan kîjan rêzik derbasdar in?

Prova û performansên li ser sehneyê yê komên muzîkê û koroyan (bi tevî amûrên bayî jî) pêkan e.

Kesên ku bi temamî nehatine vaksînkirin an jî nexweşî derbas nekirine ji bo ku li cihên girtî bikaribin stranan bêjin, wek mînak di koroyê de (herî zêde 48 saetî) testa negatîf a PCRê bistînin.